# Biyolojiya Geşbînînê

E-mail: Abdulbaghi.Ahmad@bupinst.uu.se

**Dr. Ebdulbaqî Mayî**

Geşbîniya paşerojê, êk ji xesletên taybet bi derûna mirovan ve girêdaye. Em hez ji geşbînînê dikîn. Xwandina me ya helbijartî li dor wan mirovane yên di deravên tengav û tîj de, li rojên baştir dinêrin û ji bo paşerojeka geşbîn dixebitin. Em pir qedr û qîmeta mirovên kêfxweş û geşbîn digirîn. Heta li derfetên pir teng û bê hîvî, em hizrên xwexilaskirinê nahêlîn.

Ev bernamebûna geşbîn ya ku mirov li ser hatiye avakirin dibe xesletek biyologî ya resen ji bab û bapîran bi riya cînan diçe bo nifş û toxman. Ev çende ji layê zanayek hizirzan ve hate diyarkirin. Tali Sahrot ceribandinek çêkir ku cihê geşbînînê di mejî de diyar bike. Bi alîkariya Kamîra Megmatîk, wê zanayê, şiklê mejî digirt di dema hindek mirovan hizrên xwe li ser hindek tiştên qewmî yan dê qewmî, bi rengek geşbîn yan bêlayen yan reşbîn dikirin. Diyar bo ku hizr û bîrên van mirovan di geşbîn bûn, heger ew qewmî di rastiyê de nebaş ban.

Kamîra Megmatîk nîşan da ku cihên mejî yên peywendî bi hizr û bîrên geşbîn ve hey, di parçên mejî yên sîngî yan berahî û pişta serî de hene. Her wesan du bingehên di mejî de bi navên (Cingûli) û (Amygdala) diyar bûn, ku rolek serekî di van hizr û bîran de heye. Ev bingehên mejî, bi girêdana hestan li gel hizr û bîran, têkeliyek xurt heye. Bi taybetî hestên ku peywendî li gel êmnahiyê, xweniyasîn, bawerî bi xwebûnê û şiyanên xwe ji tirs û lerzan parastinê hey, diyare bi alîkariya di navbera Amygdala û bingehên sîngî yên Cingûli dihên bi rêvebirin.

Ev lêkolîne, êk ji wan hewildanane yên van salên dawiyê gelek ji pirsên veşartî û ne diyar ji wezîfe û pêkhatiyên rih û derûnên mirovan bi alîkariya kamîre û teknîka pêşkeftî vekirîn û di nav mejiyê mirovan de, cihên wan aşkera kirîne û tê xebitîne. Bi vê çendê boçûnên zanistî xwe li hindek qebxastinên nû dide.